08.07.2020
Rûpela 1 ji 3yan

Pressestelle
Staatskanzlei 40213
Têlefon 0211 837-1134
0211 837-1405
yan 0211 837-1151

presse@stk.nrw.de
www.land.nrw

**Basın bülteni – 555/07/2020**

**Eyalet, ji bo yên bi NRW Überbrückungshilfe Plus-ê re bi serê xwe kar dikin, endamên karên serbixwe û karxaneyên piçûk fonan peyder dike**

## Serek Pinkwart: Ji bo ku şîrket karibin çend mehên pêş bi silemetî bibuhurînin dê pêkanîn bi awayekî sade, ji teralîya burokratîk dûr û ewle be.

**Wezîrîya Aborîyê, Nûxwazîyê, Jimarîbûnê û Taqetê vê xuyandinê belav kiriye:**

Birêvebirîya federal û eyaleta Bakurê Ren-Vestfalyayê ji bo ku karibin şîrketên piçûk ên nîvmezin ên ji pandemîyê bi giranî bandordîtî bêtir destek bikin, biryara ji bo Überbrückungshilfe (alîkarîya demkî) dane. Dê xwedîyên kargehên ku di mehên Nîsan û Gulana 2020î de karen wan li gora mehên Nîsan û Gulana 2019an bi kêmayî ji sedî 60 kêmtir in karibin serî lê bidin. Bi mebesta dengekirina ketinên cîroyên di nava mehên Hezîran û Tebaxê de û ji bo bergirîya têçûyînên dezgehî yên Sabit dê di çarçoveya kara wenda de bên telafîkirin. Eyalet, ji bo krêdîya karî ji bilî van bi bernameyekê alîkîraya federal temam dike: Rêncberên bi NRW Überbrückungshilfe Plus-ê re serbixwe kar dikin û rêncberên karê serbixwe dê herî pirr di seranserê sê mehan de her meh bi miqdarê 1000 Euroyî û carekê pere bistînin. Birêvebirîya eyaletê hîvî dike 100.000 kes tevlî bernameya pêvekî bibin û jê re 300 milyon Euro veqetandiye.

Wezîr Andreas Pinkwart vê xuyand: “Destpêdankirina bernameyên federal û yên eyalete gelek baş bûn. Birêvebirîya eyaletê li gora muqayesekirina tiştên ku bernameya federal ew peyder kirine, dixwaze ji bo kesên serbixwe kar dikin, rêncberên karen serbest û karxaneyên piçûk ên ji krîzê bêtir zirarê dîtî re tiştên hê bêtir bike. Ji ber vî sebebî mebesta me ew e ku em pala xwe bidin fonên eyalete û bi bernameya xwe bixwe ya pêvekî destekê temam bikin û bikin ku şîrket mehên pêş bi selametî derbas bikin. Dê pêkanîn sade, ji teralîya burokratîk dûr û bi temamî jmarî/dîgîtal be, dê alîkarî bi vî awayî demildest bigihîje.”

Serdanên bi bernameya NRW Überbrückungshilfe Plus-ê Überbrückungshilfe-ê temamkirî divên bi destê şîretkarên bacê yên serdêran, çavdêrên wan yan çavdêrên jimarkarîyê yên sondxwarî ve tên tijekirin. Birêvebirîya federal bi vê mebestê bi awayê neteweyî portaleke serdanê pêşkêş dike. Dê şîretkar karibin ji 10ê Temûza 2020î pê de li vê derê qeyd bibin û karibin dest bi dagirtina serdanan bikin. Ji bo zanyarîya bêtir a li ser serdanan bnh: www.wirtschaft.nrw/ueberbrueckungshilfe.

Birêvebirên federal û yên eyalete ji ber krîzê toreke bernameya alîkarîyê ava kirine:

**Dabînkirinên digihîjin heta 2,5 milyon Euroyan:** Bürgschaftsbank NRW di kredîtên bankê de dikare heta ji sedî notî bergîdanê bide. Bi saya bergîdana bilez, şîrket dikarin di nava 72 saetan de erêkirina heta 250.000 Euroyan bistînin. Ji bilî van bi saya  SchnellBürgschaft 100a ji meha Hezîranê ve di rewacê de ye, ji şîrketên ku heta deh kesan didin xebitandin re di kredîtên heta 250.000 Euroyan de ji sedî sed bergîdana hebûnê dikare bê dayîn. Ji destpêke salê ve, Bürgschaftsbank, hema hema 400 bergîdan û daxwazên garantîyê qebûl kirine û di vê proseyê de 5000 kar herweha parastî mane.

**Garantîyên ji 2,5 milyon Euroyan dest pê dikin:** Şîrketên hê çapmezintir dikarin serî li bergîdana eyaletê bidin. Ji bo kredîtên fona kargehan a ji ber koronavayrusê dibe heta ji sedî notî garantî bê dayîn. Ji destpêka pandemîyê ve, eyalet, bi bihayê tev li ser hev hema hema 470 milyon Euroyan ji bo bêtirî 28 garantîyên eyalete erêkirin bi rê xistine.

**Peredayînên karkirina demkurt**: Di gava vê krîzê de hîç hêmaneke din a destekê ya eyalete ev çend giring nebûbû: piştî kêmkirina derketina derve jî bi sedhezaran rêncber karkirina demkurt dewam dikin. Yanî şîrket, dema rewş baş bibe dikarin hêzeke ciddî ya karkirinê bi paş ve vegerînin û nîşan jî ber bi vî awayî ve ne.

**Desteka Rahijmendîyê NRW.BANK, Start-up**: Krîza koronavayrusê nexasim ji bo şîrketên gênc gelek zeḥmetî peyder dikin. Bernemaya fona NRW.Start-up akutê, ji bo xurtkirina sermîyana xwe bixwe bi miqdarên digihîjin heta 200.000 Euroyan kredîta konvertibil peyder dike û bi vî awayî alîkarîyê dike.

**KfW-Corona-Hilfe**: Şîrket heta vêga ji NRWê di çarçoveya bernameya koronavayrusê de bêtirî 17.000 KfW kredît bi dest xistine. Bi saya bergîdanên digihîjin ji sedî 100î, banke dikarin ji şîrketan re zû zûka lîkîdîte peyder bikin.

***Eger çi pirsên we hebin hûn dikarin ji nivîsîngeha çapemenîyê ya Wezîrîya Aborîyê, Nûxwazîyê, Jimarîbûnê û Taqetê re bişînin - têlefon: 0211 61772-204 (Matthias Kietzmann).***

***Ji bilî vê yek dikare ji vê sîteya înternetê ya birêvebirîya eyaletê jî xwe bigihînê vê metna çapemenîyê: www.land.nrw***

***Siyaseta veşarîbûnê ya çapemenîya civatî***